

Xewnên Ciwan

Enehîte Morad

Her mirovek di destpêka temenê xwe de, pir pêjin û xeyalên geş û bilind ku , ewê di pêşe rojê de duhatiyeke xweş û rind dûrî xem û qisawetan yê bibîne. Hêvî jî , weke keçike kurd xwedî pêjin û xeyalên cur bi cur bû , her roj ji berî çona zanîngehê li pêş eyinkê disekinî û bi dengê bilind bi xwe re dipeyivî û weha digot : Bi xwedê ez ji keçên xweşik û bedewim , jîrek û hişmendim bêgûman dema zanîngeha xwe kuta bikim hîngê bi dehan ew xortên hêja û ciwan yên li deriyê mala bavê min vepekin û min bixwezin. Vêca jî, ezê xotekî li gor dilxwezî û hêviyên xwe bipejirînim, Piştî demekê Hêvî zanîngeha xwe kuta dike û li benda xortekî hêja dimîne , lê mixabin sal û demsal diborîn ! Ew xotên li gor dilxweziya Hêvî li deryê malê ne dixistin rojekê weke her caran Hêvî li pêş eynikê bi dlşewat disekinî û li xwe temaşe dikir didît ku çend hevidên porê sipî di serê wê de xûya dikirin, hîngê di berxwe de dipeyivî û weha digot : Wey xalî li serê min be, va ye temenê min bûye sî û pênc sal in û porê min sipî bûye hê jî li benda xortekî hêja û dilsozim ! Ma gelo ji bo çi û sedem çiyê ku , xortên me keçike mîna min napejirînin di wa destnavê de girî lê diselitî û wê bi dengê bilind û şewat dagirî ? . Diya wê bi lez û bang dibezî, hêviya min çi heye te xêre digirî ? . Hêvî bi kesereke kûr ji diya xwe re digot : Yadê vaye temenê min bûye sî û pênc salin û hê jî , li benda xortekî dimînim, ev çi dadimendi ye ma gelo dema ez xortek bama hîngê bi serbestî minê li gor dilxweziya xwe keçikek bidîta ! Lê ji ber ku ez keçikim çênabe û ji mafê mine ! Bi girî li diya xwe dimeyizand û gotinên xwe berdewam dikirin û digot : Ta kengê emê kolê gerdîşên civakî yên pûç û vala bimînin nezanî di civaka me de serî hilde, gelo ne gunehê ku keçike mina min bi kalekî şêst

an bêtirî şêst salî re bizewice, bi vê awî hest û nestê jinê bin pê dikin, vêca jî bi bîr û baweriya civaka me ku, pêwîste keçik di temenkî biçûk de bizewice, bi vê awî pirsgirêka jinê çare ser dikin. Lê mixabin birek ji jina bi hêsanî encama vê rûdawê têne xopandin û dikevn deryê şaştiyan loma jî salê bi dehan têne kuştin û hê jî çi li vir û çi li wir ji hêla hin kesan ve gotinên pûç li guhên me dixin û dibêjin : Jin çi dixweze wê hemû mafên xwe sitandine, jin di hevdema me de rêzgar û serbixwe ye ! Bê gûman ev henek û sixêfên ew kesên nezan û rûreş in ? yadê divê ya rasit bêye gotin ku jina kurd îro li êş û janên xwe di pêjin û xeyalên xwe de mîna min pal vedaye, Loma nîvê civaka me îro ker û lale ! Diya Hêvî bi rûkî berkenî bersiva keça xwe weha dida û dikot : Belê keça min gotinên te rastin , mîna te pê nizanim tiştê dizanim ku , dema welatê mirov ne serbixwe û azad be hêmenî di tu waran de nîne , ji ber ku , pir tişt ne di destên me dane ,hêvî û armanca me ku, keç û xortên me bixûnin û pileyên bilind bistînin ta ku , karibin li rex hevdû di her warekî de rola xwe bilîzin, nezanî û nexaşiyan civakî kêr û qelis bikin: Heyif û mixabin ku , nifişên mîna te riya rast nasnekirine bi tiştine pûç û vala diponjin û temenê xwe di pêjin û xewinan de diborînin, Hîngê hêvî bi şêtmayî li dayka xwe temaş dikir û digot : belê yadê ez bi dayikên mina te pir şanaz û serbilindim îro ramanên pîroz di serê min de vejandin ? ev sîstema bavê berdewam e û welatê me bindest û dapeşkiriye bêgûman civaka me serûber yê di nava nezanî û şûmabûnê de li ber xwe bide wisan jî girînge ku , em xwe bidne hev û li li ser riya pêkianîna demiqurasî û mafên mirovan xebata xwe bajon serî.